

Nokerî, ango Koletî, Feodal, Kapîtalîzm, Sosyalîzm, Komînîzm û jîyana civakî, ku ez bi xwe jî di nav de wek herkesî dijiyam û îro jî dijm. Di sala 1965'î de ez ketim nav refê Sosyalîst û Sosyal Demokratan. Di destpêkê de ez ketim nav tevgera karkeran, bûm endamê sendîqata kinc û kolan, ku bi Tirkî ji wê sendîqatê re "Tekstîl" dibêjin. Ez heya sala 1970 di nav sendîqatan û tevgera ciwanên çep de bi çalakî xebitîm, min kar kir, lê ez di wan roj û salan de pir tûj bûm, cîhan li pêş çavên min toz pembe bû. Şerê sar di nav du (2) sazûmanên cîhanê de her berdewam bû, ku em jî alîgirê sazûmana Sowyetan bûn. Di wan rojan de Moskova ji bo min Kabe bû. Ji ber vê yekê jî min birûskên dewleta Roma Reş dikişand ser xwe. Di nav dem û atmosferek weha de, hin hevalan gotin : "Çêtire tu ji welêt derkevî. Tu xortekî zimantûj û anarşîst î. Rojekê zû ji vî welatî derkeve, ku tu neyê kuştin". Ez di roja 19-1-1970 da ji Tirkîyê derketim, min berî da cemsê başûr, kişwera nav "Awistûralya" hatim li Sydney cîwar bûm, bi tenê serê xwe, dûra bi alîkariya dewletê, zarok û bermaliya min jî hatin. Ew roj, ev roj, ez li Awistûralya, li bajarê Sydney dijm, kalekî heftê û pênc (75) salî me. Min di sala 1974'da "Komela Kedkarên Tirkîyê li Awistûralya" damezrand, di sala 1977'an da ez ji çepê Tirkan dîrketim, ketim nav civata Kurd, min Kurd rêzkirin, di 29-1-1979'da bi tev gelek Kurdên welatparêz "Komela Kurdên Awistûralya" damezrand, me serokatî jî da birayekî xwe yê Kobanî, Şahîn Bekir, û ez bi xwe jî bûm sekretêr. Di wan salan de, sedî nod û neh em Kurdên Bakûr bûn. Dûre, hin bûyer sadir bûn, nakokî û ezîtî ket nav komelê, ez ji komelê dîrketim. Min di bîranînên xwe de dîr û dirêj qal û behsa vê gelşê jî kirîye, naxwazim li ser vê gelş û babetê dîr û dirêj bisekinim û serê we xwendevan bêşînim.

Belê birayên delal, bi kurtî jîyana min wisa ye. Nivîskarîya min jî, di sala 1984'an de dest pê bûye, ku ez xwe nivîskar nahesibînim, tenê hestên xwe tînim ziman, li ser kaxiza sipî reş dikim. Bila xwendevan ji min re "Nivîskar" bibêjin, eger ku layiq im.

Xwîşk û birayên ezîz, ez li çar kîşwerên cîhanê -Asiya, Ewrûpa, Amerîka û Awistûralya- geriyam e; bûme nasê gelek gelan, bûme hevalê gelek zanyar, û sîyasetmedar, nivîskar û rewşenbîran. Li ser çiyar, di konên şivanan de bûme mêvan, û şivan ji min re bûne mamoste. Nebêjin "Şivan nabin mamoste". Bawer bikin mirov ji şivanan jî gelek tiştan fêr dibe. Li gelek welatan , bûme mêvanê profîsor, sîyasetmedar, nivîskar û hunermendan, ew jî ji min re bûne mamoste. Min bi sedan pirtûk xwendine, hêj jî dixwînim û bi hezaran jî rojname û kovar. Heya roja îro 21 pirtûkên min çap bûne; ji van piranî helbest in, sê roman, ku min yek ji Kek Newaf ra bi destan şand, dudu jî bi e-maîl jêre rêkir. Yek çîrokên gelî, yek jê berhevokû ya din dastanek evîniyê, wek ê Mem û Zîn, Sîyamend û Xecê. Niha jî di dest min de romanek heye, ez li ser wê dixebitîm. Navê romanê "GURÊN DEVBIXWÎN" ku ev jî çîroka bapîrê min e; lê, çi wext ez vê berhema xwe diqedînim, nizanîm. Lewre tendurustiya min roj bi joj ber bi xirabiyê diçe, çale pêş nêzik bûye. Hêvî dikim berî ku bikevim wê çala kûr, vê karpêka xwe jî biqedînim.

Min serê we eşand bibexşînin. Ev nivîs tenê ji bo hevnasiya me ye. Lê, li rojên pêş, hêvî dikim ez car-caran ji rûpelên Newrozê re hin tiştan binivîsînim.

Carek dî silav û rêz ji we xwendevanên hêja re. Bimînin di xweşiyê de.

Riza Çolpan.

Navnîşan: 2-Laguna st, Kelly Ville Ridge, 2155, Sydney Australia

Têlêfon: 61-2- 9629 39 90.

E-maîl: rizacolpan@gmail.com